

(ku, ko, kû) Ji hev cuda ne

(Nerînek zimanewî)

Mehfûzê mele silêman

Birayên xweşewîst û serkevî, rêvebir û nivîserên weşana NEWROZ ya hêja..

Ez silavan li we dikim, hêvîdar im hûn dilşad û serfiraz bin, piştî têbînek min li gotara ARIF ZÊREVAN ya bi navê "ferqa nêvbera **ko, ku, kû** de", ya di hejmara 92an , rûpelê (**Nerînek zimanewî**)hatiye belavkirin de,heye, bi kurtî ev e:

1- Di nav gotarê bi xwe de şaşî hene, yek jê : ku "ferq" gotineke erebî ye, û ew çêra zimanê kurdî dike (!!),ya diwan: ewe ku peyva "navber" ji "nêvber" dirustir e çimkî tîpa "**a**" di navan de û di hindurê axaftinê de tê şikandin wek: goştê berêz(angos: beraz) & çermê gê (ango : ga).

2- Avakirina gotina"zimanewî"şaş û çewt e, ne bi (kurmancî) ye, û ne bi (sorani) ye, diyare ji cem xwe, li hev siwar kiriye(!!).

3- Mamoste Arif çêra ziman û rêzimanê kurdî dike, û sê parê gotinên wî erebî ne (wek: mane, behs, waw, kaf, ferq, herf, esl,...).

4- Mamoste Arif di gotara xwe de, xwe di gelek warên rêzimên werkiriye, bêyî ku haya wî ji wî hebe, çimkî ew dûrî babetê gotara wî ne, wek: kurm , kirm, kum, kim, Kiwrd, Kurd,..., ev dikevin hindurê zaniyariya tîpnasiyê(fonîtîkê), her wekî tîpnasî jî deryake ferehe, nemaze di zimanê kurdî de, ji ber ku gelek zarav tê de hene ,û têkilî bi gelek zimanên biyan re kiriye.

5- Lê heçî (**ku, ko, kû**), ew bi xwe kî tim ji hev cuda ne, û bi awane ciyawaz wate û erkên wan bi kar tên :

a: Ku, kîteke mercy ye bi karê "heger" radibe. (wek : ku te xwend fêr bibe

- a. **Ku**, kîteke şirovekar e , rewşê diyar dike. (wek:ez çûm, ku wa li wire).
- b. **Ku**, pêşgira daçekên pirsar e.(wek: ku çi kir deyneke! * ku çawa be bibe! * ku çilobe baş e!).
- c. **Ko**, peyveke serbixwe ye, û bi zaravê hinek herêman pêk tê,wata wê jî ev e: ko=koh=kuh=ne tûj . (wek: kêra ko).
- d. **Kû**, daçeka pirsan e, ber û cih nîşan dike. (wek: li kû ma ? * bi kû ve çû?).
- e. Ew mînak û impazên kîta (**ku**), ku di helbestê Ehmedê Xanê de hatibûn dirustin, lê belê zîrekî û hozaniya Ehmedê Xanê di ziman û avakirina helbestê de (**çi, çawa, heger**) ji dû kîta **ku** hîlanîne, ne wekû ku mamoste Arif dibêje.
- f. Herdû tîpên (w,i) yên bi hev ve, şûna tîpa dengdar ya kurt (u) digre, û di nav herêmeke ji kurdîstana bakur de bi kar tê, lê mixabin ne dirust e, çimkî ji zimanê tirkî hatiye girtin, û di rêziman û bîngêhen vekîta kurdî de tune ye. Lê belê wekî ez dizanim, ku herdû tîpên (w,î)bi hev ve şûna (o)û(û) di zaravekî herêmî de digirin, (wek: gûz = gwîz * kor= kwîr * dûr = dwîr).

Li dawiyê sipsiya we dikim ,bi omîd im ku dengê min bighê we, xwendevanên we, û mamoste Arif zêrevan.

15/08/2010

